# …TU ÇI DIKARÎ BIKÎ, EGER YEKÎ DÊMÊ XWE YÊ MIROVÎ WINDAKIRIBE?!

**Ezîz ê Cewo**

Ev çendek bû, ez bi hinek lêger'înan va mijûl bûm û zêde nedik'etim întêrnêtê-Facbookê. Duh (13.05.2016) min r'ûp'ela xwe vekir û dît, dostek ji min r'a bi ÇAT-ê peyamê dişîne: "...Te nivîsa Têmûr xwend?..." – Ewî nivîsî. Min bersîva wî bi pirs da: "Çi Têmûrîk, çi nivîs?" "Çawa, mala te ava, – ewî bersîva min da, – heya Marîna Syabend jî p'ir' pê êşya bû, di Facbookê da helwesta xwe anîbû zimên!...."

Û ewî biraderî jêdera wê nivîsê ji min r'a şand: http://www.rojevakurd.com/seri-quc-e-bini-puc-e-bendana-min-u-apociyeki/ ...

Min ew nivîs a bi sernaivîsa "Serî qûç e, binî pûç e (Bendana min û apoçîyekî)" xwend, a ku T'êmûrê Xelîl nivîsîbû, Min xwend, lê ez matma nebûm, lewra ku em vî mirovî ji zûva nas dikim (û xwendevan jî nas dikin!) ewî li ser nivîsên weha yên bêwat'e û t'uje şer' û buxdan jiyana xwe avakirye... Hê dema ewî di beşê k'urdî yên R'adîoya Yêrêvanê da k'ar kiribû, navekî weha qazenc kiribû: "şer'bêj" û "buxdanbêj"... K'armend û berpirsyarên r'adîoyê, dema navê wî didan, pêsîra xwe dawdişandin, û jêr'a digotin klyaûznîkê asta yekem (klyaûznîk peyveke r'ûsî ye, tê wat'eya "şer'bêj", "buxdanbêj", ê ku derewn li mirovan gilî dike, li ser wan ji sazîyê dewletê r'a nameyan dininivîse...).

Û dema ew dinivîse, ku ewî di beşê k'urdî yê R'adîoya Yêrêvanê da k'ar kirye, lê çima nanivîse, k'a ew ji bo çi ji wir r'aqetandine?

Wek ku tê xuyanê, ew ji bilî wana tiştekî dinê nizane û nikare binivîse jî! Û li vira gotineke r'ûsan a gelêrî tê bîra mirov. Dibêjin: "Yê diz berî hemûyan dike hewar û hêwarze, dibêje – diz bigirin!" Lê gotinke gelê me jî heye, ya ku bêhtir li vê r'ewşa T'êmûr tê, dibêjin: "Jina ji r'êya xwe derk'etî ya serê k'ûç'eyan berî xwe ji ya hemberî xwe r'a tiştên bûyî-nebûyî dibêje, ji bo ku kesek eyba wê nede r'ûyê wê!"...

Bi gotinekê..., her çi jî hebepirs dertê holê:

– Gelo k'î tiştên weha yên arzan, ên ser asteke ewqas k'etî, bêwat'e û bêkêr dinivîse? Helbet, ê ku tiştekî wî yê cidî nîne, ku bikaribe wek mirovan govtûgo bike!.. An ev nexeşîyeke, ya ku dê heya r'oja mirinê bi wî r'a bimîne?

Û ev hemû ji k'u tê û çima xwe bi vî r'engî dide der?

...Dibe ku tê bîra xwendevanên hêja, li ser r'ûpelên malp'erên AmîdaKurd, Mezopotamyayê û di r'ojnameya "Pênşsa Nû" da gotara min a "…Gelo kesê bikaribin evê tê bigihîjin?.." hatibû weşandin ( http://www. amidakurd. net/qunciknivis/gelo_kesê_bikaribin_evê_tê_bigihîjin ; http://www.mezopotamya. gen.tr/gelo-kes-bikaribin-ev-t-bigihjin-makale,949.html, http://www.penusanu.com/penusanu/PN-kurdi-47.pdf ). Û ew gotar nirxandinek bû li ser wan helwest, nêr'în û dîtinan, ên ku di gotareke Têmûrê Xelîl da dabûn der (ya "Hrant Dînk ji pişta kurdan çû…" http://riataza.com/ kurdish/4960-hrant-dink-ji-pita-kurdan-cu.html ). Û ji bilî vê, wisa jî şiroveya min a ji bo gotara wî ya dinê ya "Xwedêyo, tu me ji dewletnexwazan biparêzî" di Facbookê da hebû (ji ber ki ew gotar bi r'ûsî hatibû belavkirin, şiroveyên min jî, bi r'ûsî bûn) û di wir da min ji bo r'êvebirîya malp'er'a "Riataza", ya ku ew gotar weşandibû, nivîsibû: *"K'a wijdanê we li ku ma, ma ne şerm û fedî ye, ku hûn evê gotar nav dikin?!*

*Ma ne, ev tiştekî dûrî heş û aqilan e, tiştekî weke gotina mirovekî nexweş, yê ku berpesna tiştan dibêje... û t'enê mirovekî nexweş dikaribû derewke wisa ji ber xwe derxista... lê hûn jî, heya, mirovan dawet dikin, ku evê nivîsoka vala û nexwendî binirxînin, a ku bi her cûr'e t'ewanbarîyên bêwat'e û bêr'êzîyan dagirtî ye?.."*

Û vê carê jî tiştekî bi heman şêwazî di malp'er'a ***rojevakurd.com*** da dertê ber xwendevanan û ew jî Têmûrê Xelîl nivîsye.

Wek ku tê xuyanê, ji ber ku ji bo Têmûrê Xelîl dijwar e, ku ew xwe li ber r'astîyan r'agire, ewî berê xwe daye şer' û şilt'axên gundîyên sedsalên navîn, dema jin derdik'etin

ser banê xanîyan, xwe vedik'utan nav û nûç'ik li hev dikirin û tiştên bûyî-nebûyî ji hev r'a digotin...

Lê, her çi jî hebe, her çiqas ji hêla prênsîp û t'oreya nivîsê va ev ne tiştekî anegorî r'êzdarîya mirovî ya li hember xwe bi xwe ye jî, dîsa jî, bi vê nivîsê r'a hinek r'astîyên dîrokî vebûn, û bi wana p'erdeya r'ûyê Têmûr hate çir'andin... R'asttir dibû, ku mirov bibêje – ewî bi destê xwe p'erdeya r'ûyê xwe çir'and!

Ya yekem ew e, ku piştî 40 salan r'astîya bûyerên wê demê pêkhatî derk'ete holê...

Weha ew bûyera ku Têmûr wisa berovajî dike!

Wê demê, dema divê em bibûna endamê Partîya Kommûnîst, li ser min erze nivîsîbûn (gilî kiribûn), û ji ber wê p'ejirandina endamatîya min ji bo demekê paşxistin, heya ku tîştên di wê nameyê da nivîsî tên zelalkirin, lê Têmûr derbas bû, piştr'a jî zar'okên dibistanê di nîvê salê da hiştin û r'evî bajêr...

Ji bo lêkolîna wê nameyê (ya ku li ser min nivêsibûn) nûnerê Komîtêya R'êxistana Partîya Kommûnîst a navçeyê hat û bi min r'a axivî, ewî ew name çend caran ji min r'a yek bi yek xwend, pirsên xwe dubare dikirin, ji bo ku ez bikaribim, ji wê têbigihîjim, k'a ji yên der-dorên min k'ê dikaribû tiştekî wisa binivîse... Ewî ji min dipirsî, k'a gelo gumana min diçe ser k'ê, gelo k'ê dikaribû tiştekî wisa yê k'etî û k'irêt bikira... Wê demê jî min nikaribû kesekî konkrêt destnîşan bikira...Û, baş tê bîra min, piştî çend mehan, dema her tişt zelalbû û di byûroya Komîtêya Navçeyê da pirs p'ejirandina min dibihîstin, sêkrêtarê yekem ê Komîtêya Navçeyê yê wê demê hema di destpêkê da r'ê li ber hemû pirsan girt. Ewî got: "Me pirs zelal kir, derket holê k'a k'ê ew name nivîsye, her dilê mirov dêşe, ku ew bi xwe ewqas ne hişyar bûye, ku yê ku herr'o bi wî r'a nan û xwê p'arvekirine, li ser wî şkyatan dike, lê ew haş ji xwe nîne. Ez hêvîdar im, – ewî gotina xwe bire sêrî, – ku ewê ji vir û pêva haş ji xwe hebe û hinekî hişyar be..". Wê demê min zêde wat'e neda wan gotinan, lê îro her tişt derk'ete holê: heman tiştî îro, pişt çil salî r'a Têmûr dubare dinivîse (wek ku tê xuyanê, ewî ew nivîsa xwe ya wî çaxî baş ezbere kiribûye!)...

Wan r'ojan, bi r'astî, ez p'ir' êşyam, û heya naha jî ew gotinên nûnerê Komîtêya Navçeyê, yê ku ew name dixwand, li ber guhê min in... Ew tiştên ku T'êmûr di vê nivîsa xwe ya vê dawîyê da nivîsye, yek bi yek wê nameyê dubare dikin....

Ya dinê ew e, ku Têmûr li her cîyan pesnê xwe dide, ku, xwedê giravî, ew hatye gundê P'ampa K'urdan, ji bo ku dersê bide zar'okên k'urd.

Û ev jî dereweke mezin e.

Ya r'ast ew e, ku ew ji bo du pirsên xwe ç'areser bike, hatibû gund: ya yekem, ji bo ku neçe leşkerîyê, ya duyem, ku bibe endmê Partîya Komûnîst – di bajêr da p'ir' dijwar bû, ku mirov bibûya endam... Lê wê demê ji bo yekî li ser k'arekî baş peywirdar bikin, ew divê endamê Partîya Kommûnîst bûya. Û, wê demê, anegorî qanûnên dewleta Sovêtê, kesên ku di gundan da mamostatî dikirin, ew nedibirin leşkerîyê. Û ji ber ku piştî 27 saliyê, dema çûyîna leşkerîyê t'emam dibû, hema ku 27 salên Têmûr t'uje bûn (01.01.1976), ew êdî piştî sersalê veneger'ya gund, û zar'okên gund demeke dirêj bê mamostayê mat'êmatîkê man, heya yekî dinê ji navçeyê şandin...

Û ev mirova di jîyanê da, li her deverê bi her r'ê û r'êbazên r'ast-derew ji xwe r'a p'ûana berev dike. Yek ji wan jî ew e, ku ew hewl dide, bi navê helbestvanê kurd Fêrîkê Ûsiv qîmetekî bide xwe, çi ye, ku ewî jî wê demê di heman dibistanê da mamostatî kirye... Dibîje, ku ewî û Fêêrîkê Ûsiv bi hev r'a di dibistana P'ampa K'urdan da k'ar kirine, lê, wek ku tê xuyanê, Têmûr bi wê hêvîyê ye, ku şagirt û gundîyan êdî ji bîr kirine, ka çawa Fêrîk li ber derê dibistanê, li ber ç'avên wan, şemaqek da bin guhê wî û ew da ber t'epan... Dibe ku Têmûr nizane, ku ewana sedemên wê lêdanê jî dizanin...

Wê demê ez ji navenda navçeyê dihatim, heya ez pêr'a gihîştimê, êdî Têmûr ji nava dest û p'êyên Fêrîk derxistibûn... Fêrîk p'ir' hêrs bibû, ewî bi hêrs digot: "Ez hatim gund jî, ji van ajanan xilaz nebûm!..." Ewî digot, ku Têmûr wî dişopîne, agahîyên di derbarî wî da gîhandye hinek deverên dewletê...

Ya dinê jî, dibe ku Têmûr “ji bîr jî kirye”, dema Mirazê Cemal nameyek şandibû r’ojnameya “Axîna welat” û ew name jî bi sernivîsa “Dîzê got – binê min zêr“”în e! Heskê got – malxirab, lê ez ji k’u têm?” hatibû weşandin.  A, di wê nameyê da hemû k’arên malbeta Têmûrê Xelîl hene... ji nexwendîtya wan heyea her’e- derê dizîya destnivîsên helbestvanê navdar Şikoyê Hesen. Malbeta wan piştî mirina Şikoyê bihuştî destnivîsên wî bi kapêkan ji jina wî k’ir’îbûn û ji T’bîlîsîyê anîbûn Yêrêvanê… (wê demê, piştî mirina Şiko ji hêla aborî va r’ewşa wana p’ir’ giran bû). Paşê malbeta Têmûr ew helbest bi berekê va li ser navê xwe diweşandin… Heya yek ji wan helbestan jî Têmûr li ser navê xwe bi r’êya Karlênê Çaçanî di hejmareke almanaxa wêjeyî ya “Bahara T’eze” da weşand... Ji xwe dîyar bû, ku Têmûr çiqasî ji helbestê dûr e, û ji wê helbestê jî dihat xuyan, ku ew stîla Şikoyê Hesen e... Min ew helbest bêyî navê “xudanê” wê kopî kir û  nîşanî hinek nivîsk’arên me da (Simoyê Şemo û Wezîrê Eşo  yên buhuştî, Emerîkê Serdar û yên dinê), her yekî ji wan jî, bêyî ku haş ji hev hebin, gotin – ev helbesta Şiko ye. Pişt r’a min ji Têmûr bi xwe jî pirsî, ewî got: “Ew ya bavê min bû... Û, ji ber ku Karlênê Çaçanî deyndarê min bû, min korrêktorîya (tehsîs) p’irtûkeke wan kiribû, min got, ku wê vê helbesta bavê min ber wê va biweşîne! Lê Karlên got, ku ji bo miryan honorarê p’ir’ kêm dinivîsin, k’a, em li ser navê te wê biweşînin!.. Ji ber wê li ser nave min danîn…”

A, li vira ye, ku dibêjin: “Diz ji dizan dizî, erd û asîman t’ev lerizîn!“

Her çiqas ev t’enê hinek ji t’aybetîyên Têmûrê Xelîl in, lê ew di derbarê wî da gelek tiştan ji mirov r’a dibêjin!...

Naha em bên ser p’êwendîyên min û PKK-ê, yên ku Têmûr wisa anegorî t’aybetmedîyên xwe bi “pisporî r’avedike”...

Û, k’a, gelo ew helwesta wî jî ji k’u tê, baş tê zanîn!

Di sêrî da bibêjim, eger mirov îro ji k’ê jî bipirse, k’a gelo di vê cîhanê da dijminên PKK-ê (ango, yên gelê k’urd!) k’î ne? Hemûyên jî bibêjin – dewleta t’irk û hinek xwefiroşên di nav me da, yên ku li ser pirs k’urdî bi r’êjîma faşîst r’a bazirganîyê dikin!...

Û ev mirovê hanê jî dikare t’enê di nav vê çarç’oveyê da bê nirxandin... Û zêde pêdivî bi şiroveyan jî nîne!

Lê di vê pirsê da ew di nava şaşîyekê da ye. Ji bo ku ew û patronên wî baş têbigihîjin,  bibêjim,  ku ez t’ucar ne endamê hîç r’êxistinekê jî bûme, ez dilxwazê doza k’urd im û li ser wê bingehê ez amade bûme, hemû hêz û derfetên xwe bikim  xizmeta têk’oşîna T’evgera net’ewî ya bi şerk’êşîya PKK-ê (û evê jî heya dijminên gelê k’urd jî dizanin!), ji ber ku ez îro ji bilî wê r’êxistineke dinê, ya ku bikaribe hemû hêz û r’êxistinên net’ewî û T’evgera netewî xurt bikm, nabînim. Û, ji ber ku serkêşîya têkoşîna ji bo doza kurdî PKK dike, ez bi wê r’a bûme û îro jî bi wê r’a me... Di nava p’êwendîyên min û vê R’êxistina Net’ewî da ji bilî berjewendîyên net’ewî tiştekî dinê nîne... Û ewa ku Têmûr tê nagihîje, k’a ez çima dest ji têk’oşînê û T’evgera net’ewî bernadim jî ev e!

Û, helbet, ya ku ewana gelekî dixwast jî, hema ev bû!

Helbet, ew tênagihîjin, ku ji vê hêlê va girêdaneke min a îdêolojîk bi wê r’êxistinê r’a heye, ji ber ku ew r’êxistinek e, ya ku berjewendîya wê ya sereke her ew e, ku bê hêvşandin her tiştê xwe dike xizmeta R’izgarîya Net’ewî... Ew r’êxistina fedayîyan e, û ji endamên wê, yên ku îro hê p’akr’ewan nebûne jî, sedî sed dizanin, ku dê r’oja pakr’ewanbûna wan jî bê....Û bi vê zanebûnê jî hema ew têk’oşîna xwe didomînin... Û ez hert’im xwe deyndarê wan dibînim. Û heyf, ku ez nikarim, weke wana bi aktîvî cîyê xwe di nava r’efên wan da bigirim û bi wan r’a mil bi mil têbik’oşim... Ji bo wê jî ez herroj bi vê têgihîştinê ji xew radibim, û hewl didim, di cîyê xwe da hêjayî navê wan bibim. Û ez li k’u hebim, dilê min t’imê bi wan r’a ye...Û çi ji destê min bê ezê bikim!...

Wekî dinê, kî çi dibêje, bila bibêje. Li ser vê gotineke pêşîyên me heye, dibêjin: “Devê hinekan ne paşîya mirov e, ku mirov bikaribe bigire, ha bila bibêjin!”

Û pirsa xwestina dewletê! – Bi gotina: “Dewlet!”, “Dewlet!”, dewletê çê nebe, ji bo wê k’ar û xebatek pêwîst e. Û yên ku k’ar û xebatê jî dikin, li ber çavan in. Û heya dijmin

jî vê dibîne, lê ewên ku nanê xwe li ser dijberîya doza net'ewî dixwin, naxwazin bibînin û têbigihîjin...

A, ji bo demên weha ye, ku seydayê Cegerxwîn gotye: "...Heya dijmin jî zane hûn şaş in!.."

Binihêr'in, evê "dewletnexwastina" ku ev mirovana dibêjin, dijminê gelê k'urd ê sereke Erdoxanê faşîst ji wan baştir tê digihîje – ew dizane, k'a dema doza mafên gelê xwe dikin, ew berbi k'u va dibe... Lewra jî di dema forûma Ankarayê ya li ser pirsên Destûra bingehîn a nû da ewî gotye: *"Emê bi bir'yar li dijî wan têbik'oşin, ên ku hewl didin dewleta xwe di hundur'ê dewleta me da di bin navê daxweza otonomîyê û xwer'êvebirîyê da çê bikin!"* ([https://russian. rt.com/article/147213](https://russian.rt.com/article/147213)).

Wekî dinê, ewqas heye ku mirov bibêje, em Têmûr baş nas dikin, ew tiştên ku ew dinivîse me matma nakin, hinek tişt hene, ku ev hemû li hember wan hîç tişt jî nîne...

Ji bilî wê, her çiqas mirov naxwaze heya wê asta wî nimz bik'eve jî, lê dîsa jî, ji bo ku ev mirova, yê ku çepilê xwe hildane û k'etye govenda r'ewşenbîryê, baş bê nas kirin, û ev nivîsên wî bên têgihîştin, k'a ev helwesta wî ji bo çi ye, ez li vira tiştekî bînim bîra Têmûr. Ew ewqas behsa dibistana P'ampa K'urdan dike, lê tiştên xwe yên k'etî û k'irêt nabêje, bi ya wî, yên dinê jî ew ji bîr kirine...

Dema ewî di dibistana gundê me da k'ar dikir, amojna wî herr'oj jêr'a xurek û tamtîsk dişaandin dibistanê, ku ew bê firavîn nemîne... Carekê piştî xwarinê ewî destê xwe li devê xwe xist û tiştê bêr'ê ji bo wê xanima ku jêra nan şandibû gotin... Em wê demê sar bûn me li ç'avên hev nihêr'î, û t'enê di nav me da T'êmûrê Mîro, yê bi t'emen va ji me mezintir bû, ber xwe neda û got: "Bênamûs, tu şerm nakî, ne tu nanê destê wê dixwî, ê çi ferqî – jinapa te, an dêya te!..."

Û tiştê ku îro mirov dêşîne jî, ew e, ku ev mirova îro di derbarê mirovatîyê û mirovbûnê da diaxive!

A, xwendevanê bipirse, k'a gelo em çima heya naha bêdeng bûne?...

Ya yekem, gotineke gelê me heye, dibêjin – gemar jî li mirov biger'e, mirovê biher'ime, mirov jî xwe li gemarê de, wê dîsa biher'ime!

Ya dinê jî, me digot, ku em em wisa bikin, ku bi wan mejûyê nivşên nû t'evlihev nebin.... Lê îro dem pêra gihîştye, ku, hîç nebe, hinek r'astî derên holê!

Belê, em baş hev nas dikin, hema, wek ku tê xuyan, Têmûrê Xelîl hê xwe baş nasnekirye! Dibe, ku ew hîn haşpê jî nîne, k'a di nav gel da di derbarê wî da çiqas serpêhatî diger'in...

Pirsa Lêvon Têr-Pêtrosyan û Ermenîstanê!

Min di gotara xwe ya "…Gelo kesê bikaribin evê tê bigihîjin?.." (jêdera wê li jorê ye!) da bersîva vê pirsê dabû, balkêş e, Têmûrê Xelîl çima wê dîsa berovajî dike û davêje holê?

Ez dubare dibêjim, k'a, bila T'êmûrê Xelîl ne "p'arêzerîya" van lawikan bike û ne jî li şûna wan k'urdan biaxive, yên ku wê demê p'enaber bûne, ji ber ku ew bi xwe wê demê ne di nav wan da bûye...!

Ev êdî pirsa r'êvebirîya net'ewî ya gelê ermenî ye, k'a wê çawa bikaribe van bûyeran binirxîne, wat'edar bike û dersan ji wan derîne...

Û ji bo vê jî dem divêt!

Û, eger îro em hemû kirên r'êjîmekê yên dijmirovî di bin navê qencî û başîyên gelekî da veşêrin, an spî bikinn, wek ku Têmûrê Xelîl dike, emê hem xwe, hem gelê xwe, hem gelê ermenî, hem jî mirovahîyê bixapînin...

Belê, di dema Sovêtê da em di Ermenîstanê da xwedî gelek maf bûne, belê, çand, ziman, wêje, zanist, weşanên me hebûne... Lêbelê, ew û hemû destk'evtîyên Ermenîstana Sovêtê yên wê demê bi xwe jî, encam û berhemên siyaseta Partîya Kommûnîst ya Yekîtîya Sovêtê û Hukumeta Sovêtê bi xwe bûne. Belê, gelek ermenîyên navdar di derbarê k'urdan da tiştên baş gotine... Lê ewana ne ku tiştê nebûyî di derbarê k'urdan da nivîsîne, vala-vala pesnê k'urdan dane, lê hinek r'astî dîtine û nikaribûne li hember wan r'astîyan hestên xwe

r’agirin, lewra jî bêhelwest û bêdeng nemane. Helbet, eger helwesta wan ne dostane bûya, dê ew hemû “nedîtana”, ev jî tiştekî dinê ye û ne mijara govtûgoyê ye!

Balk’êş e, çima ev r’astî ne bi dilê Têmûrê Xelîl in?

R’êvebirî û sîstêmên dewletan tên û diçin, lê gel dimînin. Û li vir Lêvon Têr-Pêtrosyan jî ji vê qanûnê der nîne, ew mirovek e û nikare wek t’evayîya gelê ermenî bê p’ejirandin. Eger em Lêvon an hineke dinê r’exne dikin, ew nayê wê wat’eyê, ku em dijî ermenîyan û Ermenîstanê ne... Berovajî vê! Gelek ermenî bi xwe jî gelek tiştên di welatê wan da pêk tê r’exne dikin... Ev tiştekî normal e, gel bi wê xwe ji kurt û kêmasîyên demê paqij dike... Lê, balk’êş e, Têmûr ji bo çi wan bûyerê neynî yên ku wê demê r’û dane, vedişêre û dip’arêze. Ew bi wê xizmeta k’ê dike? Ew ji bo çi dixwaze min wek mirovekî dijî dewleta Ermenîstanê bide xuyan? Eger em vê armanca wî (r’asttir – a ku hinekan danye pêşîya wî) binihêr’in, dibe ku ew bê têgihîştin, her çiqas dîsa pirs dertê holê, k’a gelo Têmûrê Xelîl k’îye û xizmeta k’ê dike?

Weha, eger tê bîra xwendevanê hêja, hê gotara xwe ya navborî da min bal k’işandibû ser vê pirsê:

“Û, eger Têmûrê Xelîl dibêje, divê pirsa erdên Kurdistanê û Ermenîstanê bê nîqaş kirin, gelo ew k’ara ermenîyan û Ermenîstanê dixwaze... Ma, eger sibê li ser vê bingehê nak’okî û pevçûn di nav herdu galan da çê bibin, Têmûrê li ku be? An gelo kesekî wî heye, ku beşdarî wan p’evçûnan bibe?..”

Ev pirsa berovajîkirina r’astîya dîrokî, gelo wê bik’eve xizmeta k’ê?

Û ev jî hemû nîne! Têmûrê Xelîl gav bi gav nêzîkî armanca xwe ya sereke dibe. Binihêr’in, ew çi dinivîse: “...Û dema kurd û ermenî bi hev ra bi ser ketin, wê demê hemû heqên ermenîyan, heta li xwe vegerandina erdê xwe jî, dikarin bêne minaqeşekirinê...” – Ango ji naha va, dema hê p’êla r’izgarîyê pêr’a negihîştye, hê, wek ku gelê me dibêje, dema “Hê masî di avê da ye, bazarê dike!”, an wek ku r’ûs dibêjin: “Hirç’ hê nekuştine, ç’ermê wî p’arvedikin!”?

Belê..., hema wisa – “minaqeşe!”... Û li ser çi?

Helbet, eger mirov ji hêla mejû, heş û sewda va ne nivîşkan be, dê dest xwe da têbigihîje, ku t’enê ew mirov dikare tiştên weha binivîse, yê ku ne t’enê dîroka gelê xwe, lê, her weha, bi giştî, dîrokê nizane... Lê eger ew li ser zanebûna xwe ferz bike (an, li ser nezanîyê?), wê demê, divê bibêje, k’a ew ji bo çi r’astîyan vedişêre û berovajî dike.

Hem jî, nayê têgihîştin, ev biradera wan ji bo k’ê dinivîse, çi dxwaze bibêje... û – ji bo kê? Ji bo ermenîyan? Ermenî ne ewqas saf in (ma, ew bi xwe dinivîse, ku ew miletekî aqilbend in!), ku ji van “dîyarîyên” arzan bawer bikin. Êdî li vir û wir nûnerên gelê ermenî li ser wê pirsê serê xwe dêşînin, k’a: “Gelo, eger li ser sînorê Ermenîstanê dewleteke k’urdî bê damezirandin, ermenî divê çi bikin?”... Û heya hinek tiştekî weha jî dibêjin: “Hê ne dîyar e, k’a ji bo ermenîyan k’îjan çêtir e: dewleteke k’urdan cînara Ermenîstanê be, yan – T’irkîya!?” http://www.amidakurd.net/qunciknivis/gelo_kesê_bikaribin_evê_tê_bigihîjin

A, eger ew çi ku Têmûrê Xelîl dinivîse, di nav goveka vê armanca wî da binirxînin, dê hemû şer’ û şilt’axên wî bên têgihîştin!

Dibe ku li ra xwendevan bipirse:

– Ê, paşê?!

Paşê, tştek jî nîne, tenê dimîne, wek ku di helbesta “Dirozgeya r’oja nû” ya helbestvanê ermenî yê navdar Parûyr Sêvak da tê gotin:

“…Hûn p’ifî hemû mûmên wan bikin,
Find û ç’irayên wan vêsînin hûn,
Hemû şemdanên wan vemirînin,
Ku … r’onahî bê!
Li t’u bergehan qurbana wan jî
Hûn qebûl nekin,
Ku ne ya wan e, lê hatye dizîn.

Wê qurbanê jî, ya-k wan soz daye,
R'ed bikin yekser…
………………………………….
…Û guhên xwe jî hişkem bigirin
Li hember dirozga wane şûlikî –
Li hember ewan dua-dirozgan,
Ên ku ew wisa bi hesab pey hev dixulxulînin,
Bi wê ewana xwe naxapînin,
Lê we –
We dixapînin!.. "

(wergera ji ermenî ya min e. – E. C.)

14. 05. 2016.